

Çekdarên alîgirê
Îranê û êrîsa ser
Seûdiyê

»»» R:7



Îdolojiya
êkspayir

»»» R:2



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (407) 07-10-2021 Buha (1000) Tûmen

Dîwarê me Kurdan ji
yê her neteweyekî dinê
nizimtir e

»»» R:4



Qefqasiya
duyê?

»»» R:8



Rejîm ji hêzên Kurdan ditirse

Di dawîya meha Xermananê de piştî çend roj êrîşkirina berdewam a Spaha Pasdaran bo ser axa Başûrê Kurdistanê û bi hêceta hebûna hêzên Kurdî yên dijberê rejîmê li wan deveran ku bûye sedema têkdana asayîş û aramiya navçeyê û herwisa jinavçûna jîngeha wê beşa Kurdistanê, bo carek din berpirsên leşkerî yên rejîmê di astên bilind de hatine ser hêl û gef xwarin û axavtinên bêbingeh kirin!

Rêkevta 28`ê Xermananê Berpirsê Giştî yê Stada Hêzên Çekdarên rejîma Îranê, Mihemedhesen Baqirî, tevî baskirina vê ku hêzên Kurdî gef û metirsî ne bo ser ewlehiya Îranê, car din gef ji wan Partiyên Kurdî ên dibere rejîmê xwar. “Mihemedhesen Baqirî” di civînekê digel Nûçegihaniya “Tesnîm” a ser bi Spaha Pasdaran ragihand, “ew hêzên Kurdî ji çend salên derbasbûyî mezintir û bihêztir bûne û ewlehiya Îranê xistine metirsiyê û em ti serkêşiyekê ji wan Partiyên ku niha akinçiyên Herêma Kurdistanê ne qebûl nakin” ku ev yeka ew nigeran



kirine.

Piştî vê hevpeyvînê car din li rêkevta 7`ê Rezberê, pasdarê terorîst “Mihemed Pakpûr”, Femandê Hêzên Bejayî ên Spaha Pasdaran di kombûnekê digel caş û kirêgirtiyên xwe li bajarê Sineyê ku bi hêceta salvegera şerê malwêranker ê Îran û Îraqê, binavê “rêzgirtin ji xizmeta kirêgîriyan” hate lidarxistin, tevî gefxwarin li Herêma Kurdistanê û neveşartina tîrsa xwe ji Partiyên Kurdî gefa jinavbirinê li Partiyên opozisyon ên rejîmê anî ber bas. Wî terorîstî tevî şanazîkirin bi derbasbûya teji şoreyiya xwe li pêwendî digel qirkirina xelkê “Kurdistan”ê ji destpêka şoreşê, nemaze li parêzgeha Sineyê daxwaz li kirêgirtiyên rejîmê kir ku dîsan wek caran xwe nîşan bidin da ku bikarin bi hev re pêşî ji derzkirina hêzên şoreşger bigirin!

Ew lêdwanane ku aliyê kêr di meha derbasbûyî de berdewam û li beşên cur bi cur de her hebûne, lêdwanên wan dawî pê nehatin û vê carê Pasdar Yehya Rehîm Sefewî Berdevkê Elî Xamineyî bi malpereke ser bi rejîmê re gotiye: “Nabe ti yek ji hêzên çekdar ên dibere me li navçe û nemaze di Herêma Kurdistanê de hebin û bimînin; Ev yekane bi berpirsên Îraqê re jî ragihandine. Ya baş wisa ye ku bi zûtirîn dem dev ji xirabkariyên xwe berdin!

Her wek çawa hate behskirin, ev tenê beşek in ji lêdwanê berpirsên mezin ên leşkeriyên rejîmê ku hatine gorê û kêrî nînin ew kesên ku wek miftexwerê rejîmê wêde wêde dest avêtine bi çewtkarî û propagandên jehirawî û belavkirina dengoyên nerast bo xelitandina raya giştî û çêkirina keşeke tîrs û bi`ecînî û şerê rewanî dijî gelê Kurd û tevgera wê ku rohn e tev aevane çavkanî ji tîrsek veşartî ya rejîmê girtine ku Kurd xwe berdaye nav dil, bîr û mêjiyê diktatora mezin.

Rejîm ji hêzên Kurd ditirse; Tîrsek ku nekariye û nikare jî bê veşartin û bi dirêjahiya temenê xwe bi berdewamî digel jiya ye û car digel carê zêdetir tê veciniqandin û perîşankirin.

Rejîm ji hêzên Kurdistanê ditirse, çimkî ku dizane ew liserxetbûne dawiyê wisa dike ku Kurdistan bibe bi nimûne bo deverên din û herêmên Îranê ku netewên zilimlêkirî tê de dijîn û bi kurtî eva ku di 42 salên derbsbûyî de vehûnandine ji wan bibe xurî.

Sergotar

Îdolojiya “êkspayir”



N: Kerîm Perwîzî

Tişt, emraz û tev tiştên cîhana heştdar demeke diyarîkirî hene û bi derbasbûna demê û temenê wan, ti behreyek wan namîne. Di nav hemû tiştan de jî, nemaze derman ku leşê mirov çê dîkin, ger temenê wan bi ser de here û bi wateyekê êkspayir dibin, êdî netenê behreya wan namîne, belkî dibine jehir û leşê mirovan kavil dîkin.

Îdolojî û nerîn jî ku wekî dermanan bo bîr û hizira mirovan in, ger temenê wan bi ser de here û êkspayir bin, dibine jehir bo leşê mirovan û heta sîsteman jî.

Li Îrana piştî dawîpêhatina Qacaran, sîstemeke îdolojîkiya koloniyalîstî hate avakirin ku sed sal e bi wê îdolojîyê ku piştî hatina Xumeynî, “Wîlayeta Feqîh” jî têkel bûye, deştilatdarî dîkin. Di heyamên derbasbûyî de hin bûyer di derdorên Îranê de hatine gorê ku bi tevahî derxerê êkspayirbûna îdolojiya hakim li Tehranê ye û wekî jehirê jî dibe sedemê jinavçûna sîstemê û welat jî tûşê êşeke zêde dike.

Nemaze di dehikên derbasbûyî de, Komara Îslamî du tewerên sereke ên siyasî li ser bingeha bîra du girûpan danabû û peyrewî jê dîkir. A yekem; şandina şoreşê û berfirehkirina “Wîlayeta Feqîh” û di bingeh de handana girûpên Şî`eyên tundajo di deverê de. Ya duyem; bîra “Îranşehrî” ku berfirehiya



cugrafiyaya çandîya wê bo bîrokeyeke xeyalî binav neteweya Îranê çê dîkir û di raştî de dixwaşt tevahiya deverê wekî serdemê hikûmeta “Hexamenîşîn” bixe di bin deştê Seyîd Elî Hexamenîşî de!

Li Efxaniştanê hikûmet hate herifîn û Talibana tundajo a Sunne deştilat bi deşt ve girt û dijî Şî`e, hejarî û qewimê Derî ku bingeha Fars ji wir ve hatiye nav cugrafiya Îranê, ye û dê di paşerojê de jî li dijî wan be. Ji vê aliyê jî Azerbaycana Şî`e ku berê beşek ji “Îranşehr”ê bû! Kevtiye aliyê Tirkîyê û bûye gef li ser Îranê!

Di wan bûyerane de, Komara Îslamî ger pêka îdolojiya xwe û aliyê Oliya xwe bikiriba, diba hem li dijî Ermenîştanê piştevanî li Azerbaycanê bikiriba û hem jî Azerbaycana Şî`e digel Tirkîyeya Sunne nekevîta û hem piştî Şî`eyên Efxaniştanê bigirtiba û şerê Talibanê bikiriba! Eger pêka wehma îdolojiya Îranşehrî bikiriba, diba Azerbaycan beşek ji Îranşehr baya û Îranê bo zivirandina Azerbaycanê bo nav wehma “Îranşehrî” digel Tirkîyê şer bikiriba!! Ji aliyê dinê ve jî bi piştevaniya leşkerî ji Tacîk û Deriyan, dijî Peştûyan bûya!.

Lê çimkî îdolojiyên Komara Îslamî bi tevahî êkspayir bûne û bikar nayên û êdî niha bûne jehir bo xwedî sîstema wan, li Efxaniştanê piştî Talibanê girt û di bûyerên Azerbaycanê de jî wek lîzekê bi tevahî dayina û rêya tiranzetîya wê bo Ewropayê jî hatiye qutkirin û niha xwe bi damenê Rûsiyayê re girtiye ku belkî ji deriyaya Xezerê ve rêyekê bo vebike!

Îdolojiya êkspayirî ya “Wîlayeta Feqîh” û “Îranşehrî” netenê şiyana birêvebirina welat nîne, belkî di deverê de jî nikarin siyaseta rohn bo rejîmê dabirêjin û ne dikarin piştî yên derve ku “Farsa Esîl” jî wê ve hatine, bigre û ne dikare dijî Tûranê hewila wegerîna Azerbaycanê bide! Îdolojiya êkspayir wekî jehirekê kar dike û niha êdî baregeha Xamineyî wekî baregeha şahên Qacar bûye deftera hatinûçûna Rûsan! Seyîd Elî dixwaşt bibe Dariyûşê Hexamenîşîn, ku çi bû bi Mihemed Elî Şahê Qacar!

Pêşmergeyekî PDKÎ tevî karwanê şehîdan bû

Roja Înê rêkevtî 9'ê Rezbera 1400'an a Rojî, Pêşmerge Hêza Pêşmerge Kurdistanê "Akam Deriyayî" bi sedema bûyerekê canê xwe ji dest da û tevî karwanê şehîdan bû.

Şehîd "Akam Deriyayî" xelkê bajarê Şinoyê, sala 1374'an a Rojî ji dayîk bibû. Dema ku digihîje qonaxên xwendinê ji aliyê dayîk û bavê dilsoz ve dadinê ber xwendinê û heta qonaxên navendî xwendina xwe berdewam dike.

Piştî vê ku digihîje temenê ciwanîyê, wek piraniya lawên nîştiman bi sedema bîrkirin û tēgihîştin ji zilim û zordariya rejîma Tehranê li ser ax û xelkê Kurdistanê, dest bi xebatê dike.

Şehîd "Akam" bo domkirina xebatê bi şeweyê teşkilatî sala 1393'an a Rojî pêwendiyê bi Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ve diger û wek endamek nihînî kar û çalakîyên Hizbê bi rê ve



dibe.

Piştî vê ku xebata nû ya PDKÎ hate ragihandin û Hêza Pêşmerge di navxweyî welat de dest bi kar û tēkoşan kir, şehîd "Akam" sala 1395'an a Rojî, bi fermî tevî Hêza Pêşmerge Kurdistanê dibe û çeka berevanî ji nîştimanê diavêje milê xwe. Piştî derbaskirina dewreya destpêkî ya pêşmergeyatiyê li Hêza "Taybet" tē rēkxistinkirin û dest diavêje bi kar û tēkoşinê. Bi sedema zîrekatiya wî ve, ew dibe "serpel".

Di berdewamiya kar û tēkoşinê wî de li sala 1397'an a Rojî, li Hêza 129 tē rēkxistinkirin û heta dema şehîdbûna wî, ew li wê hêzê erkên xwe lidar dixê. Di heyama pêşmergeyatiyê de çendin caran wek meimûriyeta Hizbê çûye navxweyê welat û di tev meimûriyetên xwe de serkevtî dibe.

Şehîd "Akam" xortek netirs û zîrek bû, diwartirîn demên hovîner ên dujmin dişkand û hêz û moral dida xortên Rojhilatê.

Mixabin şehîd "Akam" di bûyerek dilêş de tevî karwanê şehîdan bû û çepera xebatê bo hevçeperên xwe bicih hêşt.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi sedema canjideştana wî pêşmerge netirs, tevî nîşandan xembariya xwe, sersaxiyê dibêje malbat, kesûkar û hevçeperên şehîd "Akam" û xwe şerîkê xema wan dizane.

Xortên şoreşgêr domkerê rêbaza şehîdan in

Dewreya 252 a destpêkiya pêşmerge li çiyayên Kurdistanê dawî pê hat û hejmarek ji xortên nîştimanperwer tevî refên Hêza Pêşmerge Kurdistanê bûn.

Pêka raportêrê malpera "Kurdistanmedia"yê li çiyayên Kurdistanê, roja Yekşemî rêkevtî 11'ê Rezbera 1400'an a Rojî, dewreya destpêkiya pêşmerge li çiyayên Kurdistanê dawî pê hat û destyek ji xorên şoreşvan ên Kurdistanê tevî refên Hêza Pêşmerge Kurdistanê bûn.

Ev rêûrsme bi amadebûna beşek ji endamên rêberayeti, fermanên leşkerî, kadr û pêşmerge Hêza Pêşmerge Kurdistanê bi rê ve çû. Ev rêûrsme bi xwendina sirûda netewî ya "Ey Reqîb" û sekîndina xûlek bēdengî bo canê paqij ê şehîdên Kurd

û Kurdistanê hate destpêkirin.

Piştî "Muxtar Sohrabî" Berpîrsê Fêrgeha Fermandehiya Hêza Pêşmerge Kurdistanê peyamek taybet bi rêûresma dewreya 252 a destpêkiya pêşmerge pêşkêş amadebûyên cejnê kir. Paşê sirûdek şoreşvanî ji aliyê beşdarbûyê dewrê ve hate pêşkêşkirin.

Di beşek din a rêûresmê de rapora rahîna dewreya 252 a destpêkiya pêşmerge ji aliyê "Feriad Dirûdî" Mamoştêyê Fêrgehê ve hate pêşkêşkirin. Piştî helbestek di bin navê "Nîştiman" ji aliyê beşdarbûyê dewrê "Hejîr" ve hate pêşkêşkirin.

Paşê peyama dewreya 252 a destpêkiyê ji aliyê beşdarbûyê dewrê "Çiyako" ve hate xwendin.



Di vê rêûresmê de xelat bi ser beşdarbûyên dewreya destpêkiya pêşmerge de ku di warê "nezim û dîsîpîlîn" û herwisa waneyan de serkevtibûn, hate dabeşkirin.

Xelat ji aliyê "Tahîr Mehmûdî" Berpîrsê Dezgeha Rêkxistina Giştî ya PDKÎ ve hate pêşkêşkirin.

Dîwarê me Kurdan ji yê her neteweyekî dinê nizimtir e



N: Nûredîn Sofizade

Gelek caran mesel û şîret û gotinên berê yên mezin û bav û kalên me hatine bihiştin ku pir watedar in û her rişteyek ji wan mesele û gotinane, têra vê yekê dikin ku çendîn pirtûk li ser bêne nivîsandin.

Dema ku me bi gotinekê wiha “dîwarê me Kurdan ji yê her neteweyekî dinê nizimtir e” dest pêkir, vê wateyê dide ku her dema kesek di cihekê de nekare yan nevêre bersiva kes yan aliyekê ji xwe bihêztir bide, digere ku kîna xwe û tola xwe bi ser kes yan aliyekê ji xwe biçûktir de birêjîne.

Dujminên me Kurdan jî, ji berê ve dema ku li hember rikeber û welatekê ji xwe bihêztir şikest xwaribin û ji tirsê xwe de nekarîbin bersiv bidin, dest bicî zivirîne û kîna şikesta xwe bi ser Kurdan de rijandine.

Di v; derheqê de mînak zaf in û bi dirêjîya dîrokê gelek caran dujminên Kurdan û hikûmetên dagirkerên Kurdistan, piştî şikestên xwe her cure çek û agirek bi ser Kurdan de barandine û li Kurdistanê çemê xwînê bi rê xistîne û komkujî kirine.

Dema ku împiratoriya Osmanî bi pîlana Îngilîs û Feranse û Rûsiyê tê hilûşandin û hemî ew cografîyaya ku li jêr deshîlata wê împiratoriye de bû tê qet-qetkirin û dibe dehan welatê serbixwe, û Turkên Osmanî yên nijadperest tenê li cografîyayek biçûk a bi navê “Turkiya”ya îroyîn de deshîlata wan biçûk dibe, bona tolhildan ji hemî dunyayê û ew welatên ku împiratoriya wan herifandine, hemî kîna xwe bi ser Kurdan de



dirêjin û komkujîyên mezin li ser Kurdan bi rê ve dibin, wekî komkujîya geliyê Zîlan, komkujîya Dêrsimê, kumkujîya Agirî û...Hwd.

Dema ku hikûmetên deshîlatdar di Îranê de bi dirêjîya dîrokê nekarîne û nevêrane li hember gef û êrîş û axazetkirina Îranê ji aliyê welatên bîhanî ve bersiv bidin, hemî carê bona veşartina şikestên xwe li hember welatên dinê û bo nîşandana man û bihêziya xwe, kerb û kîna xwe bi ser xelkê belengaz û bêberevan ên Îranê û xasmanî bi ser gelê Kurd de rijandine.

Deshîlatên Îranê hertim li hember derve derdayî û şikestxwarî bûne, parekî zaf ji axa ku bi Îran dihate naskirin, her welatekê û kengê xwaştibin qetek jê perçe kirine û gelek caran heta wekî rêkevtin jî bi ser Îranê de sepandine, Azerbaycan, Turkemenîstan, parekî berçav ji Belûçîstanê, Behrêyn, giravên Ebû Mûsa, Tunbê Biçûk û Tunbê Mezin û... hwd, lê Îranê û deshîlatên navendî bona xwe bihêz nîşandanê li navxweya Îranê de komkujî li ser Kurdan kirine; dema rejîma Xumeynî hate ser kar, dest kire bi

êrîş û fermana Kurdqiranê li Rojhilatê Kurdistanê da ku bikare dîktatoriya xwe û hêza xwe bi Kurdkuştinê bide kîvşê.

Dema rejîma Îranê li şerê 8 sale yê digel Îraqê de şikest xwar û Xumeynî cama jahiyê wexwar, bona tejkirina valatiya wê şikesta xwe, dîsan Kurd kirine armanc û dest avitin bi terora rêberên Kurd ji wan Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendi û milîtarîzekirina zêdetir ji axa Kurdistan û girtin û kuştina hezaran xortên Kurd.

Dema şerê Îran û Îraqê bi dawî hat, hikûmeta Be'îsê dest avêt bi êrîşa ser Kurdan û di dawî rojên şer de bû ku bajarê Helebçê bombedûmana kîmiyayî hate kirin ku hezaran kesan canê xwe ji dest dan; wan Kurd enfal kirin ku 182 hezar kes birin û bêsersûn kirin û kirine di nava gorên bikom de.


Dema hikûmeta Sûriyê heya niha li hember welatên bîhanî de nekariye berevaniyê ji xwe bike, Îsraîl ewa 60 sal e berdewam êrîşê dikete ser û deshîlata Esedê bab û kur li hember de zelûl û damawîne, Amerîka, Firanse, Îngilîs, Turkiye bi kêfa xwe bê vê ku

hesabê bo hebûna deshîlata Sûriyê bikin, çi hez kirine di wî welatî de kirine, lê em dibînin ku hikûmeta malbata Esed tenê qehr û hêza xwe bi ser Kurdên wê perça Kurdistanê de dibarînine ku bê rehmane Kurdan digire û dike û îro bi milyonan Kurd koçber bûne, tenê li ber vê ku li hember jenosayda dujminan de karîbin xwe xelas bikin.

Ku wisa ye dujminên me Kurdan ne ev deshîlat û hikûmetên bihêz in, belkî deshîlat û hêza wan ya di rewîn û çek û cebîlxaneyaya wan û gefên wan tenê bi dijî gelê Kurd tête bikar anîn, ew jî li ber hindê ye ku divêrine Kurdan ku mixabin Kurdan dewlet çîninê, destê Kurdan ji çekên giran ên weke yê wan betal e, lê tiştê û çekekî herî bihêz li destê kurdan de heye ku ew jî xîret, bawer, îrade, xweragirî, teslîmnebûn e.

Bê guman heya niha ti hêz û êrîş û çek û komkujîyekê nekariye li hember destê betal ê Kurdan, lê îrada bihêz a Kurdan dê serkeve û heya Kurd hebe qet nakeve qedeman û teslîm nabe û ji nav naçe.

Lewitandina rûmeta jiyanê



N: Serbest Urmiye

Bila dilê we bi vê hindê xweş nebe ku tenê av û berq dê belaş bin û avahî dê ji xelkê destkurt re werin çêkirin. Eva pitirî çil salan e ku bi ser qewl û qirarên wan re derbas dibe ku di dema xwe de damezrînerê rejîma Komara Îslamê ya Îranê dabûn. Ji bilî aliyê maddî, soz dabû ku di warê me'newî de jî hewil were dan ku gel bigihînin pêgeha bilind a mirovahiye. Lê piştî heyamê han ê dûr û dirêj, di rewşa her baş de ji bilî vê çendê ku bi hezaran xelkê destkurt şevên xwe di gorên vala yên guriştanan de diqedînin û, li ser ava vexwarinê jî îsal sîngê gel bû nîşaneyê gulleyên hêzên leşkerî yên sozdarên rejîmê.

Ya herî balkeş di nameya karê her sal a rejîma han de ku qirar dabû pêgeha herî bilind a mirovahiye bike xelat bo gelên Îranê, ragihandina hêla xizanî (destkurtiyê) ye ku sal bo salê diçe di asteke bilindtir de. Di çend rojên borî de li gor ragihandinên fermî yên rejîmê astê hêla xizanî (destkurtiyê) li sînorê deh milyon Tumenan derbas kir û xwe gihande yazde milyon Tumenan. Li gor gotina pisporên warê aborî ji her 3 kesên di Îranê de, kesek destkurt e.

Di vê mijarê de em dê hewil bidin ku li gor pênaseya hejariyê di bîr û rayên cuda de, sedem û berhema hejariyê jî bas bikin. Îcar wê demê bila xwîner ji rewşa jiyana xelkê di bin sîbera Komara Îslamî ya Îranê de mêze kin, ka dê rûmeta jiyanê û pêgeha me'newî ya mirovahiye di nava xelkê Îranê de di çi asteke de ye.



Xizanî yan hejarî

Xizanî di zaniştê civaknasiyê de, dest pêrenegihîştina hewcehiyên sereke yên jiyanê hatiye pênasekirin. Hewcehiyên sereke yên jiyanê li gor pênaseya han, xwarin, cilûberg, avahî yan cihê jiyanê, saxlemî û perwerde, veguhasîn, pêkanîna jiyana hevbeş, werziş û derbaskirina demê di terzeke saxlem de tê zanîn ku li gor raya pisporan, nebûna yan dabînkirina hewcehiyên han mirov dibin qonaxa hejariyê.

Li gor danezanîna rêkxistina cîhanî ya netewetên yekgirtî jî, hejarî di rengên cuda de hatiye nasandin. Wate kêmdahatî, birsiyetî û nebûna zimherê jiyanê, nexweşî û mirin, mişextbûn, nebûna ewlehiyê û cudahî û cudahiye civakî dibin sedema serhildana hejariyê.

Li gor hizira banka cîhanî jî, destkurtî, wate bêparbûn ji xweşbijêviyê. Li gor ramana banka cîhanî, hemû aliyê xizaniyê ku di herdu pênaseyên berê de hatine gotin, bi tenê jî bingehe xizaniyê ne. Wate xizaniya birçîbûnê, xizaniya mişextiyê û xizaniya nexwandin û neçûna xwandîngehê.

Bi giştî destkurtî yan hejarî bi du terzên rêjeyî û reha tê pênasekirin. Xizanî yan destkurtiya reha, wate asta herî

nizim ya dabînbûna hewcehiyên bingehe yên jiyanê weke xwarî, avahî, cilûberg. Destkurtiya rêjeyî encama hilsengandinê ye ku ji îmkantên jiyanê di navbera mirovek û miroveke din de mêze dike. Sedemên sereke yên serhilda xizaniyê, piranî şer, tevlihevi di siyasetê de û berhevderketina sîstema aborî hatiye nasandin ku di destpêkê de û heya niha jî di sîstema Komara Îslamî ya Îranê de hebûne û hene.

Di heman demê de jî berhemên xizaniyê bo civakê jî cihê ramanê ne. Bi kurtî em dê bal bikeşînin ser berhemên xizaniyê yên berçav ku di nava xelkê di bin sîbera rejîma Îranê de hene ku hekî rewş wiha bidome, metirsiya vê hindê heye weke çand di civakê de cih bigirin: Firotna endamên laşê mirov: Bazara firotna laşê mirov ku heya niha bazara gulçikan bû, niha gihîştîye asteke ku gilêlîka çawan, ciger û heta malzaroka jinan jî tê kirin û firotna.

Mêrkirin yan zevicandina zarokên kêmtêmen: Li gor ragihandinên fermî yên rejîma Îranê, ev berçaviya han pitir pêsîra zarokên keç girtiye ku piranî di bin temenê 15 saliyê de ne û yê bûye sedem ku ji bilî sepandina jiyana han bi ser wan de, wan jî xwendin û xwendîngehê jî veqetîne.

Zarokên kar: Ya ku îro li terzeke berfireh di Îranê de tê dîtin, hejmara zarokên kar e li ser şeqaman ku hejmara wan roj bi rojê ber bi jor ve diçe. Bi terzekê ku derdê xizaniyê, destfiroşî û kar di rewşa herî dijwar de, derfeta xwendinê ji zarokan re nehiştiye.

Birçîbûn û kêmxwarin: Li gor ragihandina pitir ji %70 xelkê Îranê xwarinên hewce dest nakevin. Li gor ragihandina bîroya xwarinê ya Wezareta Tendirûştîya rejîmê, ji %88 xelkê Îranê weke hewce îmkana xwarina îmiş yê wek pancar çîninî û radêya xwarina berhemên şîr di Îranê de nizimtir e ji vê radêyê ku dibe mirov di rewşeke normal de bixwe.

Ji bilî xwazokiyê, geriyana zibildanan li pey nan û bi dehan diyardeyên nebaş yên civakî di pêxema dabînkirina jiyanê de, jordecûna astê tawan û nizimbûna temenê tawanbaran nemaze di warê dizî, kuştin û kirin û firotna madên hişber û ... de, cihê ramanê ne ku bibin pîver bo hilsengandina rûmeta jiyanê û pêgeha me'newî ya kesayetiya mirov ku niha pêsîra xelkê di bin siya reş a desthilata Komara Îslamî ya Îranê de girtiye û ya ku qirar bû ku berpirsiyarên rejîmê yên ku xwe nûnerê xwedê dizanîn, ji gel re dabînkirin.

Kê xwendevar e?



N: Bêhzad Qadirî

W: Keyhan Mihemedînijad

“UNCO” heta niha çar caran bo “xwendinevar” pênase daniye ku yekemîn pênaseya wê “xwendin û nivîsîn bi zimanê dayîkî” ye.

Belkî ji bo we cihê balkêşanê be ku bizanin wataya “xwendevar” di sedeya derbasbûyî de çi guherinkariyek zêde bi ser de hatiye û eva çaremîn pênaseya xwendevar e ku ji aliyê “UNCO” ve bi awayî fermî hatiye belavkirin. Bi kurtî û pêka wê pênaseyê, xwendevar kesek e ku bikare bi mifahwergirtin ji xwendinan û hînbûnên xwe, guherinekê ji jiyana xwe çê bike.

Li berdewamiya wê behsê û xwendineke kurt ji pênaseya xwendevar ji destpêkê ve hata niha, em ê hin xalan derheq dirûstkirina cudahiyan li jiyana li ser bingeha zaniyarî û rêkarên gihîştin bi wê mijara girîng pêşkêşê we bikin.

Pênaseya yekem; şiyana xwendin û nivîsîn

Yekem pênaseya xwendevar ku di destpêka sedeya bîstem de hate pêşkêşkirin, tenê bo şiyana xwendin û nivîsîna zimanê dayîkî bû. Pêka wê pênaseyê mirovek xwendevar tê hesibandin ku şiyana xwendin û nivîsîn bi zimanê dayîkiya xwe hebe.

Pênaseya duyem; zanîna kampiyoter û zimanek din

Di dawîya sedeya bîstem de, Saziya Netewên Yekgirtî pênaseya duyem ji xwendevar pêşkêş kir. Di wê pênaseya nû de, bilî karîna

xwendin û nivîsîn bi zimanê dayîkî, şiyana mifahwergirtin ji kampiyoter û hînbûna zimanek din pê hate zêdekirin. Ku wisa ye bi ew kesên ku şiyana xwendin û nivîsîn, mifahwergirtin ji kampiyoter û axavtin û têgihîştin ji zimanek din hebin, bi wan re xwendevar dihate gotin. Pêka wê pênaseyê heta piraniya xwendevarên zanîngehê nexwendevar dihatine hesibandin, çimkî şiyana axavtin û têgihîştin ji zimanek din nebûn.

Pênaseya sêyem; zêdekirina 12 curên xwendinê

Saziya Netewên Yekgirtî di dehika duyem a sedeya 21'ê de, dîsan guherinkariyek ji têgihîştina xwendevar çê kir. Ji wê pênaseya sêyem bigişt naveroka xwendevar guherinkarî bi ser de hat. Ku wisa ye mirovek ku li wareke zanîngehê bawernameya duktorayê wergire, aliyê kêmkî ji %5 xwendevar tê hesibandin. Ev xal jî pêk hatine ji:

1- Xwendevariya dilovanî: Şiyana berdewamiya pêwendiyên dilovanî digel malbat û hevalên xwe hebe.

2- Xwendevariya pêwendî: Şiyana berdewamiya pêwendiyek baş digel hemûyan û hînbûna reftarê

civakî hebe.

3- Xwendevariya aborî: Şiyana birêveberiya aboriya malbat, zanîna rêyên paşkevt û sekîndina balansa dexil û xercê hebe.

4- xwendevariya hîlbijartin: Eva ku mirov bizane ka kîjan berbîjêr xwediyê bawer û kîjan nebawer e.

5- Xwendevariya perwerdehî: Şiyana perwerdekirina zarokan bi awayekî zîrekane hebe.

6- Xwendevariya kampiyoter: Zanîna karkirin digel kampiyoter.

7- Xwendevariya tendirûst: Zanîna zaniyariyên girîng derheq xwarina saxlem û çavdêrîkirina nexweşan.

8- Xwendevariya regez û netewe: Nasîna regez û neteweyan li gor rêz û cudahîdanenan.

9- Xwendevariya jîngehnasî: Zanîna hin rê bo berevanî ji jîngehê.

10- Xwendevariya helsen-gandin: Şiyana nasîna helsen-gandin û danînerhev ya hin bîrokên cuda û hin sedemanînen lojîkî, bê tesûb.

11- Xwendevariya vize: Şiyana birêveberiya bikaranîna vizeyê hebe.

12- Xwendevariya zaniştî: Bilî xwendevariya zanîngehê, şiyana behs û rêçareya dosiye-yan bi rêkarên zaniştî û zanayane hebe.

Ji vê demê ve ku xwendevarbûn bi hînbûna wan xalan hatiye girêdan, ku wisa ye sîstema perwerdehî welatan jî divê pêka wan xalane şewaza wê bê guherîn.


Pênaseya çarem; zanişt digel kiryar watedar e

“UNCO” car din ji pênaseya xwendevar guherinkarî çê kir. Ji wê pênaseya nû, şiyana çêkirina guherinkariyan cihê xwe girtiye. Wate mirovek wê demê xwendevar tê nasîn ku bikare bi mifahwergirtin ji xwendinan û hînbûnên xwe hin guherinkariyan di jiyana xwe de çê bike. Di bingehe de ew pênaseye tevavkerê pênaseya berê ye, çimkî zanîna mijarekê bi wateya kiryarî nîne.

Ger ev xalên ku me behsa wan kir û hînbûn bikarin guherinkariyekê di jiyana de çê bike, wê demê em dikarin bêjin takek xwendevar e an ne.



Nerîna Lîderan



“Ned Price”:

“Amerîka û Rûsiya li ser meseleya çeka navkiya rejîma Îranê hevbîr in”.



“Turkî El-malikî”:

“Êrîşa bo ser balafîrxaneyê “Melek Ebdullah” a Erebiştanê ji aliyê balafîrên bombrêjkirî ve hatiye kirin û sê 10 kesên rêvîng hatine birîndarkirin”.



“Husên Emîr Ebdullahiyan”:

“Hekî Koreya Başûr pareyê me nede, em rêzefilmên wan di televîzyonên Îranê de belav nakin”.



“Zehira Ebdullahî”:

“Bedxwarin û nebaşîya xwerinan di hin parêzgehên Îranê û bi taybet parêzgehên perawêzxiştî de ber bi zêdebûnê ve çûye”.

Çekdarên alîgirê Îranê û êrîsa ser Seûdiyê



N: Eskender Ceiferî

Çekdarên Hosî yên Yemenê ku ji aliyê rejîma Îranê ve têne piştevanîkirin, êrîşî ser balafîrgeha Cazan li Seûdiyê kirin û di encamê de 10 kes birîndar bûn.

Tirkî El-Malikî berdevkê Hevpaymanîya Erebiya bi serokatiya Seûdiyê ragihand ku Îran dixwaze sivîlan bike armanc lê ew nagihin armancê xwe.

Di 6 salên derbasbûyî de li Yemenê 130 hezar kesan jiyana xwe ji dest dane ku 13 hezar kes ji wan sivîl in.

Îranê, li Sûriyê jî, her bi heman rengî, berî 10 salan dest bi destwerdanê kir.

Lê ew cara yekemîn, sala 2017'an li van kiryanan mikur hatin.

Wê demê Sipaya Pasdarên Îranê di daxuyaniyeke fermî de ragihand ji bo ku ew bersiva êrîşên dawî yên Tehranê bidin, wan bi moşekên dûravêj navend û ştargehên Dewleta Îslamî DAÎŞ'ê li bajarê Dêra Zorê yê Suriyê kirine armanc. Di daxuyaniya Sipaya Pasdarên Îranê de teqez hate kirin DAÎŞ'ê di 7'ê Hezîranê de li Tehranê êrîşî ser parlamentoya Îslamî û gora Rûhulla Xumeynî avakere Komara Îslamî kir û wê bersiva wan êrîşan jî biştîne. Ew moşek li Kirmaşan û Sine li Rojhilatê Kurdistanê hatibûn avêtin.

Lê hem daxuyaniya Sipahê ji bo xapandina raya giştî bû ku dibêje ew êrîşî ser DAÎŞê dikin û hem jî nîşan dida ku ew dixwazin zêdetirî berê, têrorîstên xwe li navçeyê belav bikin.

Berî 3 salan dema ku rejîma



Tdhranê li wan êrîşan mikur hat, John McCain Senatorê Amerîkî yê ji Partiya Komarîxwazan pêşwaziya kurê şahê Farsên Îranê yê berê Riza Pehlewî kir û got ku êdî dema guherîna rejîma Îranê û bicîhanîna demokrasî, aramî û azadiyê li wî welatî hatiye ji ber ku Komara Îslamî dixwaze Tehran û Libnanê bi hev re girê bide û Amerîka û cîhan, wê bi metirsiyeke gelek mezin dibînin û wê pêşîya wê bigirin. Tillerson Wezîrê Derve yê Amerîkayê jî heman tişt vegotîye.

Her heman demê, rejîma Tehranê nîşan da ku ewê di destwerdana welatên Erebi de berdewam bin. Wê demê Behram Qasimî berdevkê Wezaretê Derve ya Îranê jî bersiva gotinên Rex Tillerson Wezîrê Derve yê Amerîkayê û John McCain Senatorê Komarîxwaz da û got ev bi awayekî êşkere destwerdan e û bînpêkirina rêzikên navntewî ye. Lê tevî wê jî, siyaseta dijatiya Amerîkayê ji aliyê berpirsên Îranê ve rexne kir û diyar kir ku ev siyaseta, kîna xelkê Îranê li hemberî Amerîkayê zêde dike. Ev cara yekê bû berpirsekî bilind yê Îranê, siyaseta dewleta xwe li hemberî Amerîkayê, rexne dike bêtir ku bixwe jî rastî rexneya berpirsên Komara Îslamî bê. Ev di demekê de ye ku wan berpirsên Amerîkî ragihandibûn ewê piştevanîya wan grûp û komên Îranî bikin ku guherîna rejîma Îranê bi rengekî aştîyane dixwazin. Karvedana herî xurt ya piştî wan gotinan, gotara Yehya Rehîm Sefewî şewirmendê leşkerî yê Elî Xemaneyî rêberê Komara Îslamî bû ku ragihand

heke Amerîka êrîşî ser Îranê bike ewê hemû navendên wan hiloşînin.

Ji xwe rexnekirina siyasatên Îranê ji aliyê reformxwazan ve, tenê lîstok bûn ji bo xapandina raya giştî. Ji ber ku baweriya reformxwazan jî, wek Sipaha Pasdaran, bi berfirehkirina desthilata rejîmê li navçeyê heye ku di riya têrorîstên alîgirê rejîmê ve têne encamdan.

Rewşa ku niha li Sûriye û Yemenê jî erdewam dike, her heman encama destwerdanên Tehranê ye.

Berî heyamekê Neteweyên Yekbûyî ragihandibû ku ji ber şer û pevçûnên ku li Yemenê çê dibin û bandorê dikin ser Seûdiyê jî, welatî rastî birçîbûnê tîn.

Ji ber şerê navxwe yê Yemenê, ew welat rastî wêranbûneke mezin hatiye û rûniştvanên Yemenê ku hejmara wan derdora 30 milyon kesane, ji mafên herî kêr ên jiyana jî bêbeş mane.

Ji aliyekî din ve, wan hertim nîşan daye ku piyên xwe didanîn dewsa Îranê. Darvekirin jî, çanda wan e.

Heyamekê berî niha sizayê darvekirin 9 lesan li Yemenê hatibû bicîkirin ku weke berpirsên kuştina Serokê Konseya Siyasî ya Husiyan Salih Es-Sammad hatibûn girtin.

Niha êdî Seûdî jî dizane û tevahiya dewletên din ên Erebi jî dizanin, eger ew Tehranê sînordar nekin, wê di demekê nêzîk de hemû wan welatan bike Sûriye û Yemen.

Qefqasiya duyê?



N: Ebdûlazîz Qasim

Amerîka, her ji destpêkirina krîza Sûriyê ve û heta niha, ne li serdemê serokê pêştir Barack Obama û ne jî li serdemê serokê piştî Trump ti nexşerêyek yan jî strâtîjîyek xuya û zelal li hember paşeroja Sûriyê û çarenivîsa gelê wê pêşkêş nekiriye, û dibe ku rêveberiya Amerîka ya nû bi serokatiya Joe Biden bi heman awayî berdewam be, ku wê her tişt bi destê Rûsiya be, nemaze piştî vekişîna hêzên Amerîka ji Efxaniştanê, ku dûr nîne Amerîka ji nişkîve hêzên xwe ji Rojhilata Firatê “Rojavayê Kurdiştanê” vekişîne, wekî heman vekişîna hêzên xwe ji berî êrîş û dagîrkeriya Tirkîyê li ser Serêkaniyê û Girêspî di 9’ê çiriya pêşîn 2019’an de.

Piştî ku Amerîka hêzên xwe ji Rojava vekişandin, yekser Rûsiya destêwerdanek erênî kir û rêgirt li hember derbasbûna Tirkîyê li navçeyên mayîn di bin desthildariya PYD de, piştî vê inîsiyatîfa Rûsiyayê, careke din Amerîka hêzên xwe veherand li deverê û Trump di tweetekî de got ku Amerîka hêzên xwe ji bo zêrevaniya bîrên petrolê veherand.

Amerîka, hêzên xwe ne ji bo parastina kurdan veherand, belê ya rast ji bo ku ev petrol nekeve di destê Rûsiyayê de û Amerîka bi guvaştina Îsraîl û hin dewletên Rojavayî û bi taybetî Fransa ku rolek wê ya mezin hebû li dijî dagîrkeriya Tirkîyê û herwisa rola ya mezin hebû ji bo destpêkirina diyaloga Kurdî-Kurdî, û ya xuyaye ku Amerîka ji bo serxistina vê diyalogê cidî nîne.

Rûsiya ji aliyê xwe ve, dix-



waze vê devera herî zengîn vegerîne di bin kontrola Şamê de, û gerên diyalogê yên bi çavdêriya Rûsiya di navbera Rêjîmê û MSD de berdewam in, li gorî hin çavkaniyan ku pîrsa vê deverê di hevdiştina Putin û Erdogan de jî hatibû gotûbêj kirin, ku Tirkîya hewl dide vê deverê bêxe di bin kontrola xwe de, û li gorî hin çavkaniyan ku li ser çarenivîsa vê deverê nakokiyên mezin di navbera Rûsiya û Tirkîyê de hene, li gorî hin çavdêrên siyasî ku hêzên Amerîka li vê deverê hetahetayê namînin, û mana hêzên Amerîka bêhtir bi ewlehiya Îrasaîlê ve girêdayî ye, zêdebarî pêdagîriya Rûsiya li ser vekişîna hêzên Amerîka û hemû hêzên biyanî ji Sûriyê, û Tirkîya bi rêya tîkiliyên xwe yên bi Amerîk û NATO re, dixwaze şûna hêzên Amerîka bigire û hewl dide ku rê li pêşiya diyaloga Kurdî-Kurdî û herwiha rê li pêş diyaloga MSD bi Şamê re jî bigire bi rêya peydakirina tîkiliyan di navbera Îtîlafê û MSD de, ji bo kontrolkirina vê navçeya herî zengîn.

Hemû bizav û hewldanên Tirkîya ji bo tîkbirina doza kurdî li Sûriyê ye, û dûr nîne ku bi mifawergirtin ji nakokiyên kurdî-kurdî û bi hênceta PKK vê navçeya kurdan ya zengîn bi gaz û petrolê wekî Efrîn, Girêspî û Serêkaniyê bi rêya bazar û rêkeftinan li gel Rûsiya û Amerîka dagîr bike.

Îro bi taybetî ji PYD û ENKS, û ji hemû aliyên Kurdî yên siyasî, rewşenbîrî û civakî û herwiha tevgera Kurdî li parçên din yên Kurdiştanê û revenda kurd li derveyî welat, tê xwestin ku li ser pîrsa Kurdî li Sûriyê rêkbikevin, û dema pêwîst divê şerê man û nemanê li ser vê navçeyê bikin û rê li pêşiya dagîrkirina wê bigirin, ji ber ku tîkçûna vê navçeya herî girîng, wê bi yekcarî dawî li pîrsa kurdî li Sûriyê bê û pîrsa kurdên Sûriyê wê bibe wekî pîrsa kurdên Qefqasayê, û wê gavê dîrok rehmê li kesî nake û ew kesên xwe dibînin berpirsyar wê bikevin di zibldana dîrokê de.



3 kes ji kedkarên Rojhilatê Kurdistanê li bajarê Hewlêrê canê xwe ji dest dan

Bi sedema bûyerek hatinûçûnê li bajarê Hewlêrê 4 kesan canê xwe ji dest dan ku 3 kes ji wan kedkarên Rojhilatê Kurdistanê bûne.

Şeva derbasbûyî li ser rêya “Hewlêr- Mexmûr”ê bi sedema bûyerek hatinûçûnê sê kes ji kedkarên Rojhilatê Kurdistanê ku bo karkirinê ber bi Başûrê Kurdistanê ve hatibûn û li ser kar diçûn bo cihê mana xwe û li benda takisiyê bûne û li ser rêyê sekinîbûn, maşînek bi xêrayiya 240 KM hatiye û xwe bi wan daye û bûye sedema canjidestdana 4 kesan ku 3 kes ji wan xelkê Rojhilatê Kurdistanê bûne û kesek din jî ajotivanê maşîne bûye û xelkê Başûrê Kurdistanê bûye.



Nasnameya sê kesên canjidestdayî ên Rojhilatê yên bi navên “Muslim û Şeiban Nûcewan” ku bira bûne xelkê gundê “Hêşmava” ê ser bi devera Mirgewer û herwisa “Keywan Qasimîrad” xelkê gundê “Gucar” ê ser bi devera “Tirgewer” a girêdayî bajarê Urmîyê hatiye zanîn.

Nirxa nan di parêzgeha Urmîyê de bilind bû

Duh di bajarê Urmîyê de dora xelkê li ber deriyê nanvaxaneyan û qerebalixiya wan nîşanderê kêmbûna nan û herwisa giraniya nan bû.

Serokê Saziya Pîşe, Kangeh û Bazirganiya parêzgeha Urmîyê, “Xulamrîza Babayî”, li derheq bilindbûna nirxa nan û dorên xelkê li ber deriyê nanvaxaneyan gotiye: “Di nanê “Lewaş” ji 275 Tumen bi 300 Tumenî bilind bûye”.

Navbirî gotiye di ti cihekê dorên xelkê li ber deriyê nan-

vaxaneyên parêzgeha Urmîyê diyar nîne.

Eva jî di halekê de ku duh wêneyên çendîn bajarên parêzgeha Urmîyê li nav torên civakî de hatine belavkirin û nîşana qerebalixiya xelkê li ber deriyê nanvaxaneyan bû.

Bilindbûna nirxa nan û nebûna nan û herwisa di wê rewşa Koronayê de ku parêzgeha Urmîyê yek ji parêzgehên sor e, xelk raştî xirabtirîn pirs-girêkan hatine.



Moreyên rejîma Îranê bi piştevaniya Spaha Pasdaran “Marîciwana”yê diçînin

Pêka nûçeya gihîştî bi malpera “Kurdistanmedia”yê, li gundê “Gogce” yê girêdayê devera “Serîw” a bajarê “Merîwan”ê, çend kesên wî gundî digel sê kesên din ên xelkê “Dîwanderê” bi awayê hevpar giyayê “Marîciwana”yê çandine.

Wan çend kesên xelkê Dîwanderê hewl dabûn ku beşeke wê Mariciwanayê bidizin lê ew çend kesên gundê “Gogcê” agehdar bibûn û 2 kes ji wan

girtibûn û piştî lêdan û îşkencekirineke zêde û 2 rojan ragirtina wan di mala xwe de, piştî kaxezekê bi wan dabûne wajokirinê ku bo dizîna ajelan hatine.

Herwisa di dema ku seh kiribûn karê wan eşkere bûye û xelk agehdarê cihê şandina Mariciwanayê bûne, ew erd kêlane heta şûna wê nemîne.

Navendên ewlehî û întizamiyên rejîma Îranê agehdarê vê yekê ne û di Rojhilatê Kurdistanê de bi hevkarîya kesên



girêdayê xwe, mariciwanayê diçînin.

Nasnameya wan kesan ji aliyê malpera “Kurdistanmedia”yê ve paraştî ye.

Piştî mirinê jî belgefilma derhênerê Kurd xelat wergirt

Belgefilma “Nanê Pîroz” a derhênerê koçkirî yê Kurd, Rehîm Zebîhî û ji berhehmanîna sînemakarê Kurd ê navdar Tûrec Eslanî, di 24mîn xûla Festîvala Navdewletî ya Fîlman a Ola Îro (Religion Today) de li Îtalya xelata belgefilma herî baş a beşa pêşbirka serekî bi deşt anî.

Nanê Pîroz, berhema herî dawî ya derhênerê Kurd Rehîm Zebîhî ye ku ji aliyê kompanyaya sînemayî ya “Mad Movie” ve hatiye berhehmanî û sînemakarê Kurd Tûrec Eslanî karê berhehmanîna wê kiriye. Ev belgefilm di nehemîn beşdariya xwe ya festîvalên navdewletî de, roja 28ê Îlona 2021an di beşa pêşbirka serekî ya festîvalê de li bajarê Trento yê Îtalyayê hat nimayîşkirin û karî xelata baştirîn belgefilma festîvala “Religion Today” bi deşt xwe ve bîne.

Festîvala Navdewletî ya

Fîlman a Religion Today, bi armanca bihêzkirina ferhenga aşî û danûstandinê di nav bir û bawerî û kulturên de, herwiha dirîstkirina pireke peywendiyê di navbera sînema û olên cihê yên cihanê, di sala 1997an de hatiye damezrandin.

24mîn xûla wê festîvala navdewletî bi nimayîşkirina filmên sînemayî, belgefilm û kurtefilmên sînemakarên gelek welatên cihanê, di navbera rojên 22 heta 29ê Îlona 2021an de li bajarê Trento yê Îtalyayê hat lidarxistin.

Belgefilma Nanê Pîroz a Rehîm Zebîhî ji aliyê kompanyaya ELI Image ve û bi berpirsyariya Êlahê Nûbext di asta cihanê de tê belavkirin.

Rehîm Zebîhî ji Rojhilatê Kurdiştanê û bajarê Baneyê ye û sala 2018an di bûyereke



trafîkê de li Baneyê jiyana xwe ji deşt da.

Zebîhî di temenê xwe yê kurt ê derhêneriyê de, gelek film berhem anîn ku navên beşek ji filmên wî wiha ne: Hawar, Satalayt û Bidawîbûna Şer, Ew Zilamê çûbû Seyranê, Terorîstek Dadikeve, Roja Dawî, Stres, Semaya Rengan, Welatê Efsanê.

Berî festîvala li Îtalya, ew belgefilm di beşa “Pêşbirka Asyayê” ya 13mîn xûla Festîvala Navdewletî ya Belgefilman a DMZ de ku wek festîvala herî giring a belgefilman li Asyayê ye, li Koreya Başûr hat nimayîşkirin.

Festîvala Navdewletî ya Belgefilman a DMZ, di navbera 9 heta 16ê Îlona 2021an de, bi nimayîşkirina 130 belgefilmên ji 40 welatên cihanê ve, bi naveroka ‘aşî, peywendî û jiyan’ li Koreya Başûr hatibû sazîkirin. RÛDAW

Pêşî ji birêveçûna şanoya ser şeqam a Merîwanê tê girtin

Şanoya serşeqam a Merîwanê yek ji şanoyên navnetewî ye ku salane li wî bajarî bo heyama nêzî hetiyekê tê lidarxistin û girûpên şanokar li welat û bajarên cuda di wê festîvalê de beşdar dibin û hunera xwe didin nîşandan û bûye nasnameya bajarê Merîwanê jî.

Ew Festîvala hunerî îsal dibû 15'emîn festîval, lê du sal e ku bi hêceta belavbûna vîrûsa Koronayê rê nadin bi rê ve here.

Serokê Zanîngeha Zanişta Pîzîşkî, “Ferdîn Rizayî” got, ku bi sedema vîrûsa Koronayê û vaksînekirina tenê ji %35 a xelkê, şanoya serşeqaman îmkân nîne bi rê ve here û pir metirsîdar e. Hebûna Koronayê bo perpirsên rejîma Îranê bûye hêcetek baş û her tiştek ku bi dilê wan nebe û dijayetiya xwe tê de bibînin, rê nadin û pêşiyê digirin.

Dîroka şanoya serşeqam berî şerê cihanî yê yekem ku



girûpên siyasî ji rêya şanoyên kurt û puxit û bi dûr ji çavê dezgehên ewlehiyê ve peyama xwe belav dikirin û ew arîşeyên ku di nava civakê de û ew gendelî û zilma ku di nava deshelatê de hebû bi rêya şanoya serşeqam ve bas û belav dikirin.

Dibêjin ku huner zimanê hevpar ê hemî cihanê ye û hebûna şanoya serşeqam di nava civaka Kurdî de bestên baş bû bo şiyarkirin û gehandina arîşe û pirsîgîrîkên civakî bi guhê xelkê biyanî yên welatên din û herwisa xelkê bajarên din yên Îranê.

Yek ji arîşe û pirsên xelkê Îranê û bitaybet xelkê Rojhilatê Kurdiştanê kolberî, betalî, giranî, tûşbûna lawan bi madên hişber û... hwd e ku li salên derbasbûyî di nava wê şanoyê de hatine nimayîşkirin û ji rêya wê hunerê ve xelkê biyanî hatine agehdarkirin.

Bilî wan tiştan jî, hatina xelkê bo parêzgeha “Sine”yê û bajarê Merîwanê di warê aborî û nasandina taybetmendiyên wê parzêgahê bi xelkê re jî qazancek baş heye, lê mixabin ku eva 2 sal e hatiye ragirtin.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Cezaya girtîgeha “Mihemed Muradî” li dîwan bilin a welat hate hîlûşandin

Cezaya girtîgeha “Mihemed Muradî” girtiyê siyasî, xelkê gundê “Qebrî Husên” ê ser bi bajarê Pîranşarê li taya 34 ya dîwan bilind a welat hate hîlûşandin

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, dîwana bilnid a welat bi sedema kêmkariyên di lêpîrsînan de, cezaya wî girtiyê siyasî hîlûşandiye û dosyeya navbirî bo gengeşekirina dûbare bo wê dadgeha ku li deştêkê ew hikime bi ser “Mihemed Muradî” de sepandiye.

Ew welatiye bi tohmata “miharêbe” û endamê yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê, ji aliyê taya 1 ya dadgeha Înqilab a bajarê Mihabadê ve, bi 40 sal girtîgeh û dûrxistin bo girtîgeha bajarê Urmîyê hatibû cezakirin.

“Mihemed Muradî” berê endamê yek ji Partiyên Kurdiştana Îranê bûye û piştî vegeriyan ji wê Partiyê, meha Xermanana sala 1396`an a Rojî, li ser sînore “Kêlê” yê ser bi bajarê Serdeştê, çûbû Îranê.

Navbirî piştî vegeriyan bo Îranê, ji aliyê hêzên ewlehî yên ser bi Îtîla`ata Spaha Pasdaran ve bo lêpîrsînê bo girtîgeha Îtîla`ata Spahê li bajarê Urmîyê hatibû veguhestin.

Ew welatiye piştî bi dawîhatina heyama lêpîrsînê ji girtîgeha Îtîla`ata Spaha Pasdaran li bajarê Urmîyê, deştêkê bo girtîgeha navendî ya wî bajarî û dawiyê bo girtîgeha bajarê Nexedeyê hatibû veguhestin.

Ew girtiyê temen 35 sal, xêzandar û xwediyê 2 zarokan e û niha li girtîgeha bajarê Nexedeyê ye.

Êvareya roja Yekşemî 21`ê Rezbera sala 1398an a Rojî, du birayên “Mihemed Muradî” ên bi navên “Ebdurehman û Sadiq Muradî” li ser sînore “Kotiran” ê bajarê Pîranşarê, di dema kolberiyê de bi teqeya rasteraşt a hêzaên Spaha Pasdaran hatibûne kuştin.

Rehman Es`edî bi danîna barimteyê hate azadkirin

Roja Duşemî 12`ê Rezberê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Rehman Es`edî” kurê “Mehmûd” û xelkê gundê “Allyawê” ê ser bi bajarê Şînoyê, bi danîna barimteyê ji girtîgeha îdareya Îtîla`ata bajarê Urmîyê hate azadkirin.

Navbirî bi danîna barimteyê bi awayek demkî heya dema dadgehîkirinê hate azadkirin.

Ew welatiye di heyama binçavkirinê de, li “çavpêkevtin digel malbata xwe û deştêraghîştin bi parêzer” hatibû bêparkirin.

Roja Duşemî 11`ê Gelawêjê, “Rehman Es`edî” bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û bo lêpîrsînê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmîyê hatibû veguhestin.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser “Rehman Es`edî” de hatiye sepandin ti zaniyariyek ji ber deşt de nîne.

Aram Muradiyan bi dana barimteyê ji girtîgeha Sineyê hate azadkirin

Roja Yekşemî 11`ê Rezberê, Aram Muradiyan kurê Osman xelkê gundê “Tengîser” yê ser bi devera Jawero a Sineyê bi dana barimteyê ji girtîgeha wî bajarî hate azadkirin.

Ew welatiye bi dana barimteya 500 milyon Tumenî heya dema bi dawîhatina qonaxa dadresiyê bi awayekî demkî ji girtîgeha Sineyê hate azadkirin.

Aram Muradiyan, piştî bi dawîhatina lêpîrsînê ji girtîgeha Îtîlaata Sineyê bo girtîgeha wî bajarî hatibû veguhestin.

Ew welatiye di heyama binçavkirinê de li hevdîtin digel malbata xwe û deştêragiheştin bi prêzer hatibû bêparkirin.

Roja Sêşemî 7`ê Xermananê, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ew welatiyê Kurd binçav kirin û navbirî bo lêpîrsînê bo girtîgeha îdareya Îtîlaata Sineyê veguhestin.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê ji sedem û tohmata ku bi ser navbirî de hatî sepandin ti zaniyariyek ji ber deşt de nîne.

Wêneyên bi dawîhatina dewreya destpêkî a Hêza Pêşmerge Kurdistanê

